ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 71

**Herf-el Bai (pîta ”B”)**

**Zibanê kurdî**

Çi xeberdim bi zibanê te ji dûnya, çi ’eceb
Ji serê zulfa te û qametê yekta, çi ’eceb

Bi kerem fet’h û fîyû’zan û emîrê du cîhan
Kû bi destê me kevit dewletê ’uqba, çi ’eceb

Me ji iksîrê cemalê kû ’sefa qelb û cesed
Kû beyana me gehit a’slê heyûla, çi ’eceb

Bi dû sê ne’zregeha mu’icizê ’adet dil û sîng
Bibitin mah ’sîfet sixreyê xara çi ’eceb

Te ji aşûbê şûbatê bi ’xe’zeb ’tarî kirin(**1**)
Rûm û Tatar û ’Ecem bayedê bey’za, çi ’eceb

Bi te’hemûl be ’hîmaya te û firqet dikûdî
Kurd yêk bît û li gel ahê li dil da, çi ’eceb

Telqeyek vêmî kevit ref’e bikim b’rim giran
Li hewayê bifirim bê perr û kala, çi ’eceb

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 72

’Eceb ez mame ji ’xefletê kû bin dawî birim
Dû ’îqaban kû dema ez di xewê da, çi ’eceb

Ji mîsala serê tacê meyê xu’zraye zemîn
Kû cilewdarê me bî, qubbeyê ’xebra, çi ’eceb

Ne dûwîn belkî yekîn ez bi xû ferqê nakim
Çi kû ru’hûl quddûsîn Miryem û ’Iîsa çi ’eceb

`Sû’hufa me’irîfetê min ji hewayate kû xwand
Bi neseq bîn ji dil ’hîkmetê eşyai, çi ’eceb(**2**)

Te dibînim ji we’ten ’xeyrî muxalif ji mera
Te digû qalibê îqdarê te’ala, çi eceb

Di ’seba’hê me di wê bezmê muqeddes perîyan
Ji xirûşê dimeşîn ew bi ’sîbara, çi ’eceb

Tû bi naz û bi delalî ji wicûdê xû bikî
Bikirî lu’tfê be dîn bende gedara, çi ’eceb

Me ji şama te sîyeh ’se’h dikirin Şam û ’Îraq
Biditin celwe mera mahê bûxara, çi ’eceb

’Heyfe bazê li sema zêrzemînê bi te me’hbûs
Bi hevala bigehîtin bi semara, çi ’eceb

Li sibaqê dibitin kerreyê ca kewn û bi ’hal
Kû bibit qudweyê erbabê ’sefara, çi ’eceb

Bi sîyahê çeşmê ne’z’zare bi qedda te ’xeyûr(**3**)
Heme êksîre bi xû neqre û sara, çi ’eceb

Bi lîsanê tu dibêjî û bi destê te ye xet(**4**)
Kû bibit cewherê ’safî bi te îmla, çi ’eceb

Ne dinasî, ne dibînî, ne di fikra kesekê
Kû der a’xûşî tebit yar di gel da, çi ’eceb

Sirrê qeyyûmî d’destî heye, wi’llahî webîllah
Bi ’heyata te ketin mûrdeyî e’hya, çi ’eceb

Te dibin ’sewme’eyê sirrê xefandî me belê
Di ’zihûrê mehê taban û şikara çi ’eceb

Li serê merkezê esrarê ’heqîqet Xi’zirîn
Li şerî’et bi girîn canibê Mûsa, çi ’eceb

Ji xeyala te me dî cumle xeyalin di be’tal
E’hedê ’xeyrî te min dîtine ’enqa, çi ’eceb

Bi feqîrî di girîn ayîneya heyetê zat
Têk bebinît ’eskerê bedrê qe m’ena, çi ’eceb

Bi tifaqî û mûxalif çi bi teşbîh û qîyas
Çi xefaya, çi celaya, çi meray,a çi ’eceb

Çi xefaya bi belavî, çi celaya bi tifaq
Çi qîyasî, çi sema’î û xefaya, çi ’eceb(**5**)

Çi celaya bi ’eyanî, çi ’eyanî me didîn
Heme nîşanê gehin ber derê sara, çi ’eceb

Me ji xû destî verist û bi te yêkser digehişt
Tû merabî mededan, perde ’e’taya, çi ’eceb

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 74

Ji heqaîq ji deqaîq ji ’hedîs û ji qedîm
Ji wicûd û ji ’edem ’arifê dana, çi ’eceb

Ji şehadet ne ji ’eybê te tibînim bi yeqîn
Bi dilê çakehê ’husna te û bîna, çi ’eceb

Wacib û mûmkine ’alem bi Qur’an ayetê zat
Ji te ’haşa kû cuda bin, ji te ’haşa, çi ’eceb

Me ’tewandin di beya’zê û sewadê ser û ’hal
Were Nûrî bi tera hevdile mewla, çi ’eceb

(Leke ’tûba leke za ’husnû mîabîn we keza)
(We kelamî, we selamî leke ’tûba), çi ’eceb

---

***Eksîr: madeyek e ku naveroka tiştî diguhure, ava heyatê, awî jîyan.***
***Heyûla: şêwazî seretay hemû cîhan, heyulay ûlay hemû bûnewer.***
***Sixreyê xara: berê req.***
***Qubbeyê `xebra: esmanê şîn, esmanê bi tem û mij.***
***Xirûş: bankirin, bankirdin, bizûtin.***
***Bikirî: bikey, encamî dey.***
***Geda: sûwalker, feqîr, perexwaz, deryûze.***
***Mûrde: mirî, mirdû.***
***’Sewme’e: peristgah.***
***`Enqa: teyrekê tîjper e.***
***Ca kewn û bi `hal: Ji berê da û nuha, rabirdû û êsta.***
***Wacib: ewe ye ke zatî le xûy daye.***
***Mûmkin: ewe ye ke bonî le layan xaliqewe pêdirawe.***

(**1**)Şêx Memdû'hê Birîfkanî li ser peyva "şûbatê" nîşanek danîbû û di perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê danîbû "û şitayê" û li hember danîbû "nûsxe".

(**2**) Me`irîfet: Kirtêba ayîna Zerdeştî, yan fîqhê ewê ayînê ye, ku ji layê (Pîr Şalyarê Hewramî) hatîye danan. Zerdeştî vê pirtûkê wek pirtûka qanûnî û ayînî hesab dikin. Li gor dîtina min ev behskirine amanje ye bo wê pirtûkê ya ku li sala 400-ê hicrî li Hewremanê bi destê Musulmanan nehiştine.

(**3**)Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda nîşanek danîbû ser vê rêzê û li jêr eynî nîşanê li jûra rûpelê nivîsandibû "Bi sîyeh çeşmê te ne'z'zare bi qehra te 'xeyûr" û li hember nivîsandibû "nusxe" tê mena kû di destxetek din da bi vî awayî jî dîtîye.

(**4**) Mebest ew e ku dema kurd bi wî zimanê dipeyve û bi destê xwe binivîse wê demê ew nivîsîne eger bibte gewherekê pakij cihê sersurmanê nîne, anko ecêb nîne.

(**5**) Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li jûra vê rêzê nivîsandibû "Çi qîyasî çi sema'îne xefaya çi 'eceb" û li hember vê rêzê nivîsandibû "nusxe" tê mena kû di destxetek din da bi vî awayî jî dîtîye.

**Mebesta vê helbestê ev e: ger kurd xudanê ziman û xet û xak û wilatê xu bit, gişt ev tişte bêne encamdan, cihê sersurman ê nîne, çunke kurd bi xwe şiyana encamdana van gişt tiştan heye.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 76

**Şeb**

Rabe her cuziek ji bû teqdîsê rû'hî maye şeb
Her şibê tabanê rûyê rûmehan, lêdaye şeb

Qet heye sermayeyî dîdarê 'hînan keswete
Xel'etê dilber bidit, xoş xel'etû, sermaye şeb

'Su'hbetê E'hmed me her meq'sûde ya rû'hel emîn
Ma tu nabînî se'hergahit, 'hebîbû'llaye şeb

Dil birîndarî di 'işqê, ger te me'tleb her ewin
Ab û xûna dil dirêjit, serbixû lisewdaye şeb

Dehir vêra namûxalif xame û şehwarîye
Bayedê bey'zayê Mûsa, bi fexrî tesbîta şeb

Kîmyager bê bînaw ûstad û bê rû'h û cesed
Qet 'eceb nîne di destda qudretê e'hyaye şeb

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 77

Le'h'zeyek nîma şebê 'ha'sil bibit kafî meye
Xi'zrû Ilyasin me vêra xûşî û rehraye şeb

Teşnêganê (lem yezel) kirîşmeyê se'hkin meyî
(La cûrrim) dê bin 'sefaî 'husn û ser jê maye şeb

Qe'treê nûşî dibînî, pêşî çavan sed bî'har
'Ilmê Me`anî te 'ha'zir, qismetek deryaye şeb

Min bi hevsarê şebê û 'hişk, ji şehbazê serî
Girt û ehlîyet geha, ger çendî her tu naye şeb

Zehreyê berraq û sûr maher se'her berqê didit
Qehqeha 'tebi'ê mirî û 'zulmetî ger maye şeb

Ademî sirrê eger cem'îyetî 'ha'sil bikit
Roj û şev herdû bi xû wek Adem û 'Hewaye şeb

Serderê hew'za şihûdê bî xûd û hem bî xuzî
Sîretê sermet mî'sale bî xûde û hem baye şeb

Hîmmeta der şeb bidit telqê di perrtî ta felek
'Topa cengê se'hergahê qewî, balaye şeb

Mesiela xûn û xîyalê vê dinê pirsê nekin
'Alemek dîye lê hîn bi 'hîkmetê 'xew'xaye şeb

(Ma werai) vê 'alemê min dî bi sed elwan û reng
Ewel û axir bi xû ferzende lew jî zaye şeb

Her kesek ger xû bibînit be'hrê bê payane ew
Mewcî be'hrê qulzûm ez, wey Dîcleyî de'iwaye şeb

Sîneyî pir ez ’ecaîb tê mûkerrer, rast û çep
Kes nizanit vî dilî ew çend pirî, heyhaye şeb

’Heq dizanit min ji ber wechê mûnewwer, perde dir
(E’i’zeme’llah) ev çi wecihû perdeî, ’tû’xraye şeb

Dergehê fey’za şihûdê, ew bi şev meftû’h bî
Sef’heyî ’arif çû berqa, lami’e û meclaye şeb

Sed hizar sala li xû geryam û qet min xû nedî
Dil bi xû şeinê ’e’zîm her vê demê ’hisyaye şeb

Çal û zîndana bi xû têda bi zincîr û qefes
’Hel kirin yêk yêk ji xû berda bi xû, geryaye şeb

Ez bi çavê ’heq dinêrim, lew dibînim dûr û dwîr
Ez peyapey ’heq diçim, lew pê meher meşyaye şeb

Ez bi ezmanê te der guftarha gûyendeim
Lew bi ’ilm û sirr û ’iêrfanê, ziban gûyaye şeb

Ez bi ’ilmê heq dizanim dil bi xû ’heq meskene
Lew me dil teşbîhê ’tore û agirê Mûsaye şeb

Ez bi xû ferqê qe nakim, ez ewim ya ew ezim
(Kullû şeyîn halîkûn) lê her tinê yek maye şeb

Şêxê ’Ebdûlqadirê Geylanî û Bes’tamê pîr
Şemmeyê miskê Xûten, ’ember fişanî maye şeb

Sirrê lahûtî benasûtî me her memzûce lew
We’hdeta mû’tleq ji tew’hîda me sirrê laye şeb

La îlah ez lew dibînim, danebêjim ’xeyrî hû
Meddehî yahûye îllel’llahû, menfî haye şeb

Er fena qet pê helînit, er beqa raci’i bikit
Er bi’zahir xulqî lê, ew wa’hidê yektaye şeb

Ger tu însanî bi çavê î’itîra’zê qet menêr
Er tu ’heywanî, xû de’iwaya te bê de’iwaye şeb

Bû te în’safek fere, ’ilmê me ’hew’za kewsere
Bê cedel bigre bi xû, jê sedreyê ’tûbaye şeb

’Herf bi ’herf cewher mîsalin, şîrê merdan qe’sde ew
Mûşterî kêmin meger, ew lûilûê lalaye şeb

Ger ti fanûsa te hilbit şem’ê sirr pertû bidit
Xûş dibînî min çi ’hîkmet gûtîye û danaye şeb

Er şikûrî wer kifûrî cahilî ya ’xafilî
Min ji bû ’sa’hib dilan ev sirrê me’ina daye şeb

(Ecme’et erbabû ’îrfanîn ’ela e’hkamîhî)
(Înne mîn hazal fetal te’hrîrû) xûş fetwaye şeb

(Leyte mîn beynîkûmû za fî’tnetîn yelqahû hel)
(Qarin lîlbe’hrî zal emwacî men) înşaye şeb

(Kullû ’zîdde ’ilmîhî men ’zîddehû felyefqehû)
(Înne zal Nûrîyû fî îmlaîhî) mewlaye şeb

Şeb nizanim qewse ya çeşmê ’xezale ya xe’te
Cameyê Cemşîde Nûrî, ya bi xû bînaye şeb.

*Sermayî: destmaye, darayî, serma.*

*Keswet: cil, kinc.*

*Kîmyager: kesê kû mijûlî 'ilmê kîmyayê ye, kesêk xerîqî kîmya be.*

*Têşnêgan: tînûkan, têhnî, têhnû, tî.*

*Krîşme: naz û ciwanî.*

*La cirim: bê guman*

*Bê payan: bê kûtayî, bê dûmahî, bê dawî.*

*Perde dir: perde dirandin.*

*Gûftarha: witarekan.*

*Gûyende: qiseker, witebêj (min be zimanî tu witarekanda dême qise).*

*Miskê Xûten: miskên kû ji 'xezalên deşta Xûten li rojhilata dûr tînine der.*

*Lahût: Dunya ruha, dinyay erwa`he.*

*Nasût: Dunya cisma, dunyay ecsame.*

*Sedreyê 'tûba: dara behiştê, darî behişt, dara be'hiştê, dara cennetê.*

*Er fena: ji nav çûn, le nêw çûn.*

*Er beqa: mayîn, manan, manewe.*

**Çi zanin heyietê**

Ya reb çi zanin heyietê, ev nare ya ’tennare ’hub
Be’hs û beyana qî’setê, xûş qî’se û guftare ’hub

Guh din beyana mu’hbetê, vê meselê û ’hîkmetê
Herçî kû çavê dil detê, zanî çi xûş kirdare ’hub

Mûsa yedî bey’zaye ew, ya mu’icizê ’Îsa ye ew
Ya Qey’serû Kîsraye ew, ya wa’hidê qehhare ’hub

Ya kase çîn û badeye, ya cewherê canê meye
Ya benkeya meyxaneye, yanî di dil da nare ’hub

Ev ru’hê canî bilbile, ew ’endelîbê dilkule
Ew nêrgize yan sunbile, ev ’xûnçeyî pirr xare ’hub

Ev ba’xe yanî gulşene, ya ’zulmetî ya rûşene
Fincanîya ser pûşene, ya gulşenî gulzare ’hub

Ev nûr û ’erşê kursîye, ev cînne yanî însîye
Yanî firûşt û qudsîye, ’a’saye ev ya mare ’hub

’Seyyade yanî baze ew, ya kebke yanî qaze ew
Ya merkeba ’huccaze ew, xergûşe ya şenqare ’hub

Yanî ’e’sa ya tace ew, qarûre yanî ’ace ew
Ya ba’isê tarace ew, canêmeyê bîmare ’hub

Miskê sîyeh gîsûye ew, gul destîye mûmaye ew
Ev ’sub’he yanî rûye ew, reştûze ya şemmare ’hub

Zincîre yanî sîlsîle, reşmare yanî kakile
Ya fecre ya riqqa dile, ya bedre ya enware 'hub

Dewra li bedrî eqrebe, ken'anî caha 'xeb'xebe
Ya sîlsîla kakûl şebe, ya eqreba settare 'hub

Bin kûşîya zêrê zere, ya mi's'hefa sîmenpere
Sergûşe qulfa dilbere, meyxane û xemmare 'hub

Ya berqe'a şeb 'tarîye, ya roje yanî 'tarîye
Me'hbûbe yanû barîye, ya zeybeqa dewware 'hub

M'eşûqe ya 'uşşaqe ev, mexlûqe ya xillaqe ev
Bedra sipî berraqe ev, ya le'ile ya mirware 'hub

Ew ke'ibe û qîbla mine, guldeste yanî gulbine
Peykane dildarê mine, ev niştерê dijware 'hub

Ew ke'ibe min jê îstîlam, eswed 'hecer pê kir selam
Min dî nûha 'sub'h û 'zelam, roj bû li min êvare 'hub

Eswed 'hecer bû 'haccîyan, şêx û mirîd û 'sofîyan
Meydan tijî kir nîkîyan, ev 'heyderê kerrare 'hub

Kuştin li wan kir bê 'eded, ev dilbera awir esed
Reştûzeyê qewsê semed, dildabire 'xeddare h'ub

Dil daye ber tîr û xedeng, min dî nûha Rûm û Fereng
Lew tên ji dil pêt û pereng, mecrû'he dil bêçare 'hub

Hindî şekir xara bitin, çeşmê sîyah şehla bitin
'Umrê me jî pêda bitin, 'tali'i me bext ya nare 'hub

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 83

’Hub ’tali’e hem Kîmya, herçê ji dilber dî vîya
Xûş qîsmete kakûl sîyah, ew mehweşa dildare ’hub

’Hub cewherê erwa’he ew, ya rûzeyê eşba’he ew
Mifta’he ya fetta’he ew, qehare ya cebbare ’hub

’Hub xuld û abê kewsere, ’hub neynika Îskendere
’Hub şah û mîr û beglere, ya zulfe ya ’terraze ’hub

Ev cewherê m’enaye ew, hişyare yanî paye ew
Dilşade ya damaye ew, bêhûşe ya bîdare ’hub

Tew’hîde yanî muşrike, ’sûret nema yêk neynike
Ev mûhre yanî mûn’hîke, ’sabûne ya qe’s’sare ’hub

Qe’s’sare yanî rendeşe, sîqale yanî dilgeşe
Yanî cemalek bê ’xişe, ya tûbe îstî’xfare ’hub

Ev tûbeyî dilsûze ew, yapûşe yanî kûze ew
Ev tîre ya reştûze ew, ya dîne ya ’hişyare ’hub

Ev dîne yanî aqile, danaye yanî cahile
’Tolaze yanî qabile, ev pake ya feccare ’hub

Feccare yanî qence ew, kenzîne yanî gence ew
’Xemgîne yanî rence ew, yanî ezê bêzare ’hub

Qelbîye ev ya rû’he ew, ev keştîye ya nû’he ew
Canê meyê mecrû’he ew, ya sîneyê ’xembare ’hub

Îrşade yanî hadîye, ev Şame ya Be’xdadîye
Te’ilîme yan ûstadîye, ya mûrşidê salare ’hub

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 84

Salare yanî rehbere, e’s’habe ya pê’xembere
Yanî îlahê ekbere, îslame ya kuffare ’hub

Îslame yanî kufrîye, iksîre yanî sûfrîye
Teisîre weqf û cûfrîye, ya zûhre û ’teyyare ’hub

Zalnûne yanî be’hre ew, Fîr’ewne yanî qehre ew
Kelkûne yanî jehre ew, Cercîsa ya neccare ’hub

Cercîse yanî Yûnise, teinîse yanî mûinîse
Alale yanî nêrcise, yanî ezê pir kare ’hub

Yanî ezê ’xemnake ew, ya dilberê çalake ew
Elmase ya ’hekkake ew, ya ’aşiqê merdare ’hub

Ev şahidê ’halê mine, wek mahî kû palê mine
Faî’z û reismalê mine, xûş şahidû îqrare ’hub

Belkî reqîb û şahide, ’ha’zir qerîb û camide
Yanî recîmê mûl’hide, ya kîzbe ya înkare ’hub

Însane ya şeytane ew, sekrane ya kufrane ew
Îşrake ya îmane ew, bêdîne ya sebbare ’hub

Ev re’ide yanî berqe ew, tabane rû ya şerqe ew
Tacê sere ya ferqe ew, xûş xel’etû tîmare ’hub

Tîmar û bar û bexte ew, kûçk û sera û texte ew
Ev hespe zîn û rexte ew, ya şahe ya xundkare ’hub

Ev Şahe yanî Qey’sere, Kîsraye ya Îskendere
Ev xemre yanî ’Heydere, ya fêrisê fîlare ’hub

Ew fêrisê meydane ew, ya E'hmedê 'Ednane ew
Ya'zille ya sêwane ew, ya kehfe ya dîware 'hub

Menşûre 'hukumê mûttefeq, derqeyde yanî mûn'teleq
Jêk fe'sle yanî mûlte'seq, peyweste ya bizmare 'hub

Me'zbûte yanî 'zeb'te ew, merbû'te yanî reb'te ew
Mexbû'te yanî xeb'te ew, ev dare ya minşare 'hub

Çekûçe yanî teqteqe, meftû'he yanî reqreqe
Bismare yanî şeqşeqe, 'hedade ya bî'tare 'hub

Me'hbûbe ya mel'ûne ew, mewhûbe ya me'xbûne ew
Me'ibûbe ya meftûne ew, me'trûde ya muxtare 'hub

Muxtare ya me'trûde ew, m'es'ûde ya me'ihûde ew
Me'hrûme ya merdûde ew, harûte ya se'hare 'hub

Ev qu'tbe ya 'ebdale ew, Cibrîle ya Mîkale ew
'Irfane ya e'hwale ew, mezkûre ya zekkare 'hub

Eqlame yanî katibe, îlhame yanî wahibe
'Ellame yanî rahibe, ev xe'te ya xe'tare 'hub

'Esmane yanî er'ze ew, meb'sû'te yanî 'er'ze ew
Mesnûne yanî fer'ze ew, mihtabe ya eqmare 'hub

Ev be'hre yanî 'hûte ew, ya nefte ya barûte ew
Ya eskerê 'Talûte ew, pir mewce ya enhare 'hûb

Dijware yanî agire, ûstade ya pêlagire
Şemşîre yanî çagire, elmase ya mûkkare 'hub

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 86

Ev raste yanî xîb’te ew, ’xufrane yanî ’hîb’te ew
Ya zexref û mûnxe’te ew, mektûbe ya ’tûmare ’hub

Ev milke yanî berzexe, nîva wicûde ya rexe
’Se’hnayî cînne ya refe, ya bejin espîdare ’hub

Lazim tizanin penge ew, bejna şîrin û şenge ew
Xûş nab û nayû çenge ew, ya ’xin’xina ewtare ’hub

Qelbê meyê pirbêje ew, zanim dema’xa gêje ew
Çavê mudami’irêje ew, ya sînê pirî hare ’hub

Wi’llah tizanim qerqeşe, çeşmên sîyah xala reşe
Reftare yanî bêhişe, mexmûre ya xemmare ’hub

Buşraye lê mizgîne ew, Ferhade ya Şîrîne ew
Yanî Memûyê Zîne ew, belkî Melayê jare ’hub

Ev ewwele ya axire, ev ba’tine ya ’zahire
Ev ’hîkmetê dinyagire, teqdîre ya îqdare ’hub

Azale ya abade ew, me’snû’e ya ûstade ew
Qanûne ya mû’itade ew, î’icaze ya şehware ’hub

Ev e’sle yanî ’un’sûre, ya xak û ab û agire
Belkî ji wan ’tahir tire, ya miştê xakê pare ’hub

Ya miştê xakê Ademe, ya e’slê hindî ’aleme
Ev lew’he yanî xateme, fermane ya berdare ’hub

Ev jûre yanî jêre ew, ev şerre yanî xêre ew
Îmrûze yanî pêre ew, ya sirmûyî naçare ’hub

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 87

Deryayê bê payane ew, ’ellameyê sîrrane ew
Ya Nûrîyê pêzane ew, ya me’idenê esrare ’hub

---

**Kirdar: kirdewe, kar.**
**Xar: dirik, dirû, dirî, sitirî.**
**Gîsû: zulf, bisk.**
**Kakûl: perçem.**
**Le’il: berek giranbihaye.**
**Mirwar: mirwarî, lûlû, lûilûi.**
**Peykan: tîr, rim.**
**Nişter: cûrekê çeke mîna xencerê, çeqoyek nûktîj.**
**Nîkî: pakî, çake.**
**Kîmya: ’ilmê kîmya.**
**Mehweş: ciwan wek hîvê, ciwan wek mang.**
**Neynik: mirêk, awêne.**
**Genc: gencîne, xezîne, xezêne.**
**Zuhre: kewkebeke bi navê ”Zuhre”.**
**Zelnûn: îşarete bû pê’xember Yûnisê Zelnûn.**
**Tîmar: çakirdinî birîn, dermankirina birîna.**
**Peywest: bi yêkva nisyayî.**
**Mehtab: ronahiya heyvê, mangeşew.**
**Şemşîr: şîr, şûr.**
**Xîb’t: karên nerast û durust, karî na dûrûst.**
**’Tûmar: namek dirêj, namey dûr û dirêj.**
**Milke: behişt.**
**Dinyagir: cihandagir.**
**Miştê xak: mista axê, miştê xol.**
**Çeşm: çav, çaw.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 88

**Rast û çep**

Rast û çep tîr dane canî rast û çep
Qews û reştûzê kivanî rast û çep

Bê dil û în'saf û 'zalim fitnexîz
Sîne 'xerbal kir nihanî rast û çep

Ez di xewda bûm me dî bêmirwetan
Rête canê min nişanî rast û çep

Tîr û rim dilma di navê 'helqe reng
Min bi e'hwalê nezanî rast û çep

Er'ze dil lew wê dibarit her li ser
Şibhê qe'trê esimanî rast û çep

'Xem ji min na hilgirit lew 'huccetan
L'yêk tigêrîtin nihanî rast û çep

(Mallezî 'îndî we malî ya feta)
(Hakeza xella cefanî) rast û çep

(Ente meûsûmûn bî'zûlmîn qeblema)
(Cae te'hqîq imtî'hanî) rast û çep

Lê me her dewrane şibhê guljenî
Em li dewra ba'xebanî rast û çep

Vê cefayê her li nefsa xû diket
Bes yekîn bêşik ne sanî rast û çep

Ez birîndarê kivanî mal helek
Ev Zuleyxayê zemanî rast û çep

Lê bila Nûrî fîdabit her tinê
Dilberê bînim te Xanî rast û çep

E'hmedê mûxtare dilber Nûrîya
Kamirad û kamiranî rast û çep

Ey Mû'hemmed şêwe 'husna bê ne'zîr
Mûfrî'ten 'hetta kû anî rast û çep

Cergê Îtûtî te kir armancê tîr
Şibhetî Şêxê Yemanî rast û çep

---

**'Xerbal: moxilk, bêjing, bêjîng.**
**Sîne 'xerbal: singê minê kûnkûnkirî, wek bêjingê.**
**Nişan: bi nîşan.**
**Kamiran: bextewarî, xûş'halî.**

## Li Kurdistanê kîvî ez

Mû'hemmed hate mî'iracê, yeqîn ez her ewim ya reb
Ji sîne şibhê wehacê, çi nûra pirtewim ya reb

Bi xû Mûsame etbînim, b'qelbê neynik û ayînim
Xelîlû'llahê yasînim, îmamê peyrewim ya reb

Şeva tarî kû rojim ez, ne'îmê xûldedûjim ez
Welêkin sînesûjim ez, meger ez bêxewim ya reb

Disûjim ez bi narê xû, bi nar û qehrê yarê xû
Ru'hû canêt neyarê xû, bîyar û pehlewim ya reb

Bîyar û pehlewanim ez, s'peh salarê wanim ez
Xudawendê cîhanim ez, kû Se'idê qeylewim ya reb

Bi xû fey'za îlahim ez, bi text û şah kulahim ez
Li ser 'alem çi mahim ez, şirînû xesrewim ya reb

Bi xû kewînê guftarim, hevalê 'teyr û we'hşanim(**1**)
Wekî bilbil bi ef'xanim, di kûzêda kewim ya reb

'Hewwa û Ademe dîsa, ezim ev Miryem û 'Îsa
Suleymanî û Belqîsa, zi 'işqê na'hewim ya reb.

Wekîlê gumbeta keskim, li dinyayê bi xû miskim
Li gûftarê nema beskim, di kûzêda kewim ya reb.

Çi kewkê xûşî ezmanim, çi însû cînnû sûl'tanim
Çi Qessê dêr û rehbanim, li 'halê me'hyewim ya reb

’Hekarîme Silîwî ez, li Kurdistanê kîvî ez
Ji kirmancê nişîvî ez, ji behdînan ewim ya reb

Ji behdînanê xa’sim ez, ji pîranê xewa’sim ez
Li meydanê reqa’sim ez, ji de’iwa nakewim ya reb

Eger mîrim, eger begler, bi xû Nûrî çi xûş rehber(**2**)
Li ber çawim tenê dilber, nîmaye her hewim ya reb

---

**Pirtew: tîşk, rûnahî, tîşkî nûr.**
**Peyrew: kesek li pey tiştekî digere.**
**Speh Salar: serkirdey leşker, serleşker.**
**Şah kûlah: tacê şah, kûwî şah, tacê şah û melik.**
**Xesrew: şahê Îranê ye, kû ji ”Şîrîna Ferhadî” hez dikir.**
**Kewik: kew, kebk, teyrê kew, kevotk.**

(**1**)Du peyvên ku di nav vê rêza helbestê da li alîyekê destxeta Şêx Memdû’hê Birîfkanî bûn, lê pir zehmet têne xwandin, bi vî awayî nivîsandîye: ”Bixû kûyîn kifdanim (kifpanim) hevalê ’teyr û we’hşanim” û herwiha bi vî awayî jî mirûv kanê bixwîne: ”Bixû kewînê kifşanim (givdanim) hevalê teyr û we’hşanim”.

(**2**) Ev rêze bi awayek din jî hatiye nivîsîn.

”Eger mîrim, eger begler, eger Nûrîme xûş rehber”.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 92

**Ey ’sa’hib**

Me li ser text û qedîfa we digû ey ’sa’hib
Heme xûşî me d’dîn ez tu peyapey ’sa’hib

Camîya kewser û xûş rewneq weqtê ’se’herê
Me jê ingûştî semen dî bimeda mey ’sa’hib

Bi selamet b’gehî meqsed û ’heccê bikirî
’Hecer eswed bi mera rûze tûnadêy ’sa’hib

Te hebû nazik û rencûr û ’ze’îfek ne ew
Li çi kare tu ’îlaca me çawakey ’sa’hib

Nûhe xanim ji reqîba me bihîstî xeberek
Me li gel xû li sefergahê tûnabey ’sa’hib

Te du sê roj û şevan roj li min şev ker dikir
Fer’ze heqqê me ji nû qencî edakey ’sa’hib

Were carek bide guh qi’seyê derdê me birî
Ji fîraqê çi cefa bû li me heyhey ’sa’hib

Te nedî ahû fî’xana me çawa tat ji dil
Te digû sîneyê ma çeng û ’sedaney ’sa’hib

Şukur lîlahî kû çûn qebr û ’hîsab û ’ere’sat
Tû li me êdî nema cewr û cefakey ’sa’hib

Bi der a’xûşî me can daye beşîrê te jinû
Qence xanim me bi guftarê xûrakey ’sa’hib

Weqte yekta bi girî qametê serwîn û şefaf
Bi zebadê bireşînî û celadey 'sa'hib

Were dîwanekê mêrane û şahê bi şevê
Bigirî wa ji dinê min bi xûşakey 'sa'hib

Camê telx û meyê engûr bi destî bi nigîn
B'me dey hemnefesê merde rûhakey 'sa'hib

Dû kelaman di serayê te bi guftarê şirîn
Tû xeberdey ez dilê xeste şîfakey 'sa'hib

Te bi dîdar mu'zeffer dikirin şah û emîr
Nûhe weqte kû tu gazî 'ûlemakey 'sa'hib

Me 'heyata ebedî xûş dîye der 'su'hbetê şeh
Rabe da salikê rahî bi beqakey 'sa'hib

Be yeqîn Yûsifê Mi'srî û te nînin çû bûha
Xuld û cawîdî bi yêk mewkûbehakey 'sa'hib

Were şukraneyê dîdar bi ke canê şirîn
Te divê 'sidqeyê ev zulfê du'takey 'sa'hib

'Imrê Nû'hî du salî me biwar û ne bû têr
Dilê têşne tu ji nû pirsê me nakey 'sa'hib

Tû dipûşî û dinûşî li der û pencereyan
Bi sîyeh şehle nîgeh ber feqerakey 'sa'hib

Dû hizar zewq û 'sefa min ji te îmsal didîn
Lê te hêj fikre bi min zewq û 'sefakey 'sa'hib

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:56 PM Page 94

Dinê abad dikey, yarê xû hem şad dikey
Dêwê meli'ûnî kû tamar û fenakey 'sa'hib

Be mirada te bitin destê du'ayê Nûrî
Vediket çendî helalê me kûşakey 'sa'hib

---

**Ingûşt: tibil, tilî, pence.**
**Camêtelx: şeraba t'el, şerabî tal.**
**Nîgeh: çaw, rûwanîn.**

**’Imrê ’xalib**

Axir bi namiradî, bûrî me ’imrê ’xalib
Dil têşne û neşadî, dîtin me pir ’ecaîb

rojê ku da Kusûfê, ’tarî dibin meşariq
Heyva me nahilîtin, pê rûn bibin mi’xarib

Destê di xû dimeştin, qetla mirî du şêxan
Xûna me her dirêjî, sîmîn ber û ’hebaîb

Dilxûşîya reqîbî, der hîcreta ’xerîbî
Sunnet kirin ’hebîbî, lew çûne min e’taîb

Çendî hebûn me xûşî, ya xûrram û xurûşî
Yêkser me dî fanebûn, ’heyfe kû bûne ’xaîb

’Sa’hib cemal û yêkta, serwa xiram û hemta
Vajî kirin ji qanûn, her defter û ketaîb

Qalûbelê me dî mîr, dilber di deste şemşîr
(Fîqetlî kullî ’sebbîn, zû şîddetîn we ra’xîb)

(Re’xmen) me bê newayan, bîmar û bê dewayan
(’Hukmûl ’hebîbî carîn, fî ’zulmetîl teraîb)

(La te’icibû meqamî, fî sadetî kîramî)
roja Welîdê Hindî, (’sûfîyetel re’xaîb)

(Qed şabe ’ûnfûwanî, welwe’slû ma cefanî)
Dilber me dî ciwanî, (fî ekberîl şewaîb)